



Agahî di derbarê pêvajoya daxwaznameyên vîza însanî de

1. Vîza însanî; wate û pîvan

Li gorî SEM ê, welatîyên biyanî, yê ku ji bêçarî dixwazin welatê xwe biterikînin, dikarin bi rêya nûnertiya Swîsre li derveyê welêt pirsax daxwaznameya vîzeyê bikin, bê gelo ew dikarin ji ber rewşa xwe yî şexsî vîza ji bo Swîsre werbigirin yan na. Vîza ji ber sedemên însanî dikare li gorî benda 4., jêrbend. 2 VEV were dandin, dema **bi awakî eşkere û jidil giyan û laşê xwediyê daxwaznameya vîzeyê di bin gef û tehdîdê de be**. Kesên ku berê li welatekî sêyemîn dimînin, bi giştî tê qebûlîkirin ku tu gef û tehdîd li ser wan nîn e.

https://www.sem.admin.ch/sem/de/home/publiservice/weisungen-kreisschreiben/auslaenderbereich/einreise_in_die_schweiz.html „Weisung: Humanitäres Visum gemäss Art. 4 Abs. 2 VEV“

Mirov divê bikaribe gef û mexdûriyeta şexsî heya dereceyê bilind îspat dike an jî bihêle jê were bawerîkirin, eger ew bi cih neyê, wê daxwaznameya vîzeyê neyê qebûlîbikirin. Tenê hebûna tevlihevî û sertên şer li cihê ku mirov lê rûdine, têrê nake û ne bes e, ku mirov vîza însanî bistîne. Di rastiyê de û wek qanûnê xwestin, ku kesên daxwaza vîzeyê dikin bi Swîsre re girêdana wan hebin, (wek mînak bi rêya malbatî).

Ji bo kesên daxwaza visa dikin îmkanî heye, ew li cem sefaretê yan jî li cem SEM pend û meşûreta **Şansa ne resmî bidest bixin**. Ev nixandineke demkî ye ji laiyê hikûmetê ve, ka gelo daxwaza visa dê were qebûlîkirin yan jî na. **Daxwazeke fermî dikare piştê her û her li cem nûnertiya an jî sefareta Swîsre were kirin, ev yek jî ne girêdayî bersiva hukûmetê ye.**

2. Pêvajoya lihevîkirina ji bo demdiyarkirinê

Daku mirov bi fermî daxwaza vîza însanî ji bo Swîsre bike, divê ew ji bo demdiyarkirinê bi nûnertiya Swîsre re li derve **rasterast** têkeve têkîliyê. Daxwaz divê piştê bi şeweyekî kesane li cem nûnertiya Swîsre were radestîkirin.

E-Mail rêya herî baş e ji bo danîna sozê. Hûn dikarin navnîşanên nûnertiyên Swîre di vê girêdanê de bibînin: <https://www.eda.admin.ch/eda/de/home/vertretungen-und-reisehinweise.html>

Di E-maila ji bo daxwaza standina sozê de gerek e ev agahiyên dîtir hebin:

- Daxwaza **vîza Însanî** tê kirin (ne vîza-mêvandariyê!)
- Paşnav, nav, rojbûna hemû kesên dixwazin daxwaza vîza însanî bikin
- Paşnav, nav, rojbûn û navnîşana yek an jî çend xizmên li Swîsre dijîn (heke ew hebin)

Haydarî: Daxwaza ji bo vîzeyê mesrefeke bilind û xeteriyekê bi xwe re tîne, ji ber ku divê mirov ji bo vê yekê biçe welatekî sêyemîn.

Ji ber vêya em ji we re pêşniyar dikin ku hûn baş bifikirin û berî biryarê bidin, dibê hûn di derbarê şans û xeteriyên li pêş we ne baş bifikirin.



3. Pêvajoya di wexta sozdayinê de:

Ji bo vîza însanî balyozxane pereyan naxwaze!

Soz ji bo wexteke pir kurt tê dayin û ji ber vê ya lazim e **pir baş hatibe amadekirin.**

Divê hûn van **belge û kaxetên** li binî bidin destê sefaretê:

- Kopyek ji E-maila ku tê de tarîxa sozê ji bo hevdîtina vîzeyê heye
- Formeke (1) daxwaznameya vîzeyê temam dagirtî (bi Almanî, Fransî, Îtalî an jî Îngilîzî) bi nivîsa makîne an jî bi tîpên gir û bi înzeya kesane. Hûn dikarin Formê li ser vê girêdanê bibînin: <https://www.sem.admin.ch/sem/en/home/themen/einreise/visuman-tragsformular.html> „Antragsformular für ein nationales Visum D“.
- Belgeyek seferê (Passeport an jî nasname)
- Kopyek ji belgeyên seferê
- Du (2) sûretên şexsî, nû û wekhev ji bo passeportê
- Defternameya Malbatê a hûr û kûr (Defter Al aelê)

Hemû belgeyên ku bi Almanî, Fransî yan jî bi Îtalî nehatine nivîsandin, divên ji aliyê mutarcimekî resmî ve bi Îngilîzî yan jî bi yek ji van zimanên banî werin tercemekirin.

4. Mektûba pêvekirî

Ji kerema xwe re bi daxwaznameyê re bersivên van pirsan bi Almanî, Îngilîzî an jî Fransî bînin. Rewşa mirov divê **nivîskî** pir bi kitekit û berbiçav were şîrovekirin, daku hemû agahiyên ji balyozxaneyê re ji bo qerarê lazim in, hebin. **Agahiyên ku mirov tenê bi devkî bêje nayên qebûlkin.**

- Pirsgerêkên xwe yî şexsî li welatê xwe bi awakî berbiçav bidin naskirin.
- Hûn li cem hukûmeta cihê hûn lê rûniştine/dimînin an jî li cem UNHCR qeydkirî ne? Eger na, çima na? Eger erê, rewşa pêvajoya daxwaza we li cem UNHCR çi ye?
- Hûn li kampên penaberên Sûriyê li parastin û hîmayetê geriyane? Eger na, çima na?
- Rewş û mercên jiyana we ji aliyê (Xanî, xizim û mirov, rewşa maddî) li cihê hûn lê rûniştine/dimînin çawa ne?
- Çima berdewamkirina mayîne li cihê hûn lê rûniştine/dimînin ne mumkîn e?

Eger hûn **tenê ji bo xwestina vîza însanî derketibin derveyî welatê xwe**, gelekî girîng e hûn vê yekê bi **nivîskî** di bersivên xwe de li ser pirsan bêjin.

Wexta lazim be, hûn dikarin nimûneyekê/nemûzecekî ji vê nivîsê bi Almanî, Îngilîzî, Fransî an jî Îtalî daxînin.

5. Kontrol kirina ewlekariê:

Li Sefaretên Beyrût, Qahîre an jî Emanê hin kontrolên ewlekariyê yê zêde dikarin bînin. Ev jî dikare dema bendîmanê dirêjtir bike.



Eger pirsên we hebin an jî bêtir agahî ji we re divên, hûn dikarin li ser vê navnîşana li jêr bigihînin me:

miq@redcross.ch

E-Mail rêya herî baş e ji bo hûn bikaribin xwe bigihînin me

058 400 42 00

(Hûn dikarin roja duşemê û pêncşemê xwe bigihînin me ji 14.00-16.00)

Divê pêşde li ser sozekê were lihevkin

Schweizerisches Rotes Kreuz
Beratungsdienst humanitäre Visa
Abteilung Soziale Integration und Migration
Werkstrasse 18
Postfach
CH-3084 Wabern

Hemû xizmetên SRK yê ji bo şewirmendiya vîza însanî bêpere ne.

Tu xebatkarên Beşa şewirmendiya vîza însanî ya SRK yê ji welatên hûn jê tîn an jî ji welatên sêyemîn tune ne.

Tu bandora beşa şewirmendiya vîza însanî ya SRK yê ji bo stendin an jî ne stendina vîzeyê, li ser SEM ê tune ye.